



Bundesamt
für Migration
und Flüchtlinge

KURMANDSCHI

Koçber di jiyana Rojane de hema xurt in (MiA)

Kursên ji jinan bo jinan



Integration



Kursên MiA taybet bo we

Gelo hûn hez dikin bi rêkêkî jinên din bibînin?

Gelo hûn hez dikin almanî baştir bizanin?

Gelo hûn hez dikin li bara muqatebûna zarokan, dibistanan û kar pirtir têbigihîjin?

Gelo hûn hez dikin almaniya xwe di leza bi dilê xwe de baştir bikin?

Wê demê, hûn hema rast hatinekurseke MiA.

MiA kursek e ku jin didin jinan.

Kursên MiA bi gelemperî li klasê de tên lidarxistin. Hûn li wir li bara wan mijaran diaxivin ku bo we girîng in. Hûn dikarin almaniya xwe baştir bikin.

Li hin rojan de hûn bi hev re diçin derve, wek mînak bo bajêr nas bikin.

Pir caran derfetên din li kursên MiA hene, wek mînak dirûnkarî, stran yan wênesazî bi hev re.

MiA derfeteke kursê ye ku jin tê de hev û din xurt dikin. Hûn xwe han didin. Hûn xwe perwerde dikin û gelek tiştên nû fêr dibin.

Kursên MiA çawan kar dikin?



Koma kursê tenê ji jinan pêk tê.
Seroka kursê jî jinek e.



Jinên din ji welatê we yan ji seranserê
dinyayê ne.



Kursek bi qasî 34 demjimêran dikişîne û di
nava çendîn hefte yan mehan de belav dibe.



Hûn dikarin sê kursan hildin.



Naveroka kursê ji we re guncaw e.
Seroka kursê bala xwe dide vêya.



Hûn neçar nînin tu tiştî bo kursê bidin.

Li ku dikarim kurseke MiA peyda bikim?

Serdana www.bamf.de/MiA bikin. Hûn ê li wir agahiyên pirtir û
kurteyêke hemû pêkhînerên kursan peyda bikin (qaşo Träger).

Kî dikare beşdar bibe?

Hûn divê herî kêr 16 salî bin ku bikarin li kursa MiA beşdar bin. We divê mercên dibistanî yan huneristanî li Almanyayê kuta nekiribin. Herwiha hûn divê ji yek ji komên jêrê bin:

- Hûn biyanî ne û destûra we heye bi awayê herdemî li Almanyayê bimînin.*
- Hûn penahxwaz in yan ji Eritre yan Sûriyeyê bin..
- Hûn penahxwaz in û beriya 1 Tebaxa 2019'an hatibin Almanyayê. Destûra we ya mayîna herî kêr sê mehan hebe. Welatê we welatekî ewle nebe. hûn kar dikin yan li dû karekî ne yan zarokeke we heye ku pêwîst nake biçê dibistanê. **

Eger hûn piştrast nînin gelo ev şîrove bo we bi kar tê yan na, bi pêkhînerêkî/a kursekê re pêwendiyê çêbikin. Ev dikare arîkariyê bide we.

* Li gor madeya 44, beşa 1, qanûna 2 ya Peymana Mayîne.

Jinên ji Ewropaya Rojavayî, DYA, Kanada û Avûstralyayê nikarin beşdar bibin.

** Li gor madeya 44 beşa 4 benda 1 ya qanûna Peymana Mayîne.





Kurseke MiAbo min çi dike?

«Kurs bi kurs xwebaweriya min zêde bûye û li bara pêşeroja xwe difikirim.»

Atika Benz


«Kurs gelekî arîkariyê dide min ji ber ku ez peyvên nû hîn dibim.»

Omaima Youssef

«Li vir nava koma jinan de em gelekî xweş derbas dikin.»

Adebah Kayi Ghali

Cihê bo agahiyên pirtir:



Agahiyên ser weşînerî

Weşîner:

Bundesamt für Migration und Flüchtlinge
90461 Nürnberg

Roj: 02/2020

Çap: Silber Druck ohG, Lohfelden

Pêşnûma: MediaCompany – Agentur für Kommunikation GmbH

Itibara wêneyê: Karin Desmarowitz/serdêrr, S. 2, S. 5;
Yvonne Michailuk/S. 4

Sipariş:

Publikationsstelle des Bundesamtes für Migration und Flüchtlinge
www.bamf.de/publikationen

Hûn dikarin vê weşîneyê bikin berdest jî Belgeya PDF'ê daxînin.

Dewleta Federal vê weşîneyê wekî beşek ji karê xwe yê têkiliyên giştî diweşîne. Weşîne belaş tê belavkirin û bo armanca firotanê nîne. Partî, kampanyavan yan xebatkarên hîlbijartinan nikarin di dema kampanyaya hîlbijartinan de bo aramancên hîlbijartinê vê bi kar bînin. Ev bo hîlbijartinên federal, parêzgehî û xwecihî herwiha hîlbijartinên bo Parlamana Ewropayê bi kar tê.



Li vir me bibîne

 www.facebook.com/bamf.socialmedia

 [@BAMF_Dialog](https://twitter.com/BAMF_Dialog)

Other Language 

www.bamf.de/publikationen

www.bamf.de